REXNE Û KIRYARA REXNEYÎ DI ÇEND GOTINEKAN DE

Nihmetelle Nihêlî

Rexne wekû zarav gelek raman û wateyên cude cude bi xwe ve hilgirtîne, bi dirêjahiya dîrokê guherîn li ser raman û têgeha wê hatiye kirin. Lê nuhe, her çende gelek pênase jê re hatine kirin, piraniya wan, di şirovekirin û sengandin û biryardena berhemê edebî de di hevirêne, li dû wê araste ya rexnegir, temaşey berhemê edebî dikin, guhorînên lawekî li ser pirinsîpên karkirinê de dihête kirin.

Rînê Wîlk dibêje:“ Rexne, pêkhatiye ji wesifkirin, şirovekirin, pêdeçûn, sengandin û biryarden li ser karê edebî û diyarkirina binemayên îstatîkî û gengeşekirin li ser têgehan di nav rêrew (Siyaq)ê hunerê edebî û rewanbêjiyê de”.(1) Ji ber ku biryarden jî, di xane ya têgehê rexneyê de ye. Lewma rexnegir, ji encamê çend xalekan digehe wê biryardenê, ew jî:

1- Rewşenbîriya rexnegirî û astê wî yê hizirî, hunerî û rêbaza wî, ji bo dîtina wê têkistê ewa rexneyê lê digire û derêxistina kodên zimanî (peyvên kilîlî) û peyama dewiya têkistê rolê xwe tê de dibînin.

2- Ew paşmayê dîrokî, civakî û rewşenbîrî, ya rexnegir (kodên zimanî) yên xwe jê derêxistîn li ser binemayê wan rastiyên di wê qûnaxê de, heyîn.

3- Şêwazê dehênerî, îstatîka û ciwaniya berhemê edebî pê hatiye nivîsîn û avakirin û peyama xwe bi rexnegirî de, gehandî.(2)

Ew kesê bi encamdena karê rexneyî radibe, divê, ev nîşanên li xwarê, li dev hebin:

1- Xwedî mêşkekê aram û hişyar be û bi hîç renegekê reqiyê û şikandinê bi kar neîne.

2- Hoşmend û bîrrtîj be.

3- Pêdiviye vekolînê di hemû bûyerên têkistê de bike, de bikaribe sengandineke durist bike.

4- Divê rewşenbîreke hemelayenî hebe û di wî warê rexne yê de dike, yê pispor be.

5- Divê bi çavê rastiyê berhemî bibîne, her wekû MaytoArnold dibeje: "Çavê derxistina rastiyan û çawaniya nivîsînê û îstatîka berhemî be."

6- Nabê bi hîç rengekê bikeve di bin biwarên kesokî û hevalînî û arezûyên taybet ve, karê wî ji bo avakirina berhemî û xizmetkirina zanistî be.

Di biyavê rexneyê de, çend cemserek hene, rolê xwe di avakirin û dehînana rexneyeke durist û nêzîkî ketwarê rastiyê û ciwaniyê dibîne, ew jî (nivîser, têkist, xwendevan in). Di navbera wan de bandoreke pêçewanî heye.Em dikarin bi vî nexşeyî diyar bikin:

Xwendevan Têkist Nivîser

Ev cemserên rexne yê her yek **xwe di çend biyavekan de, dibîne:**

1- Cemserê nivîserî (dehêner):

Pêdiviye barê rewşenbîrî, jîngeh, siruşt, îdolojiya, serederî, rexne û fakterên civakî, aborî û siyasî tê de berçav bihête wergirtin, anku bawerî bi desthelata nivîserî hebe.

2- Cemserê têkistê (سلطه النص) :

Pêdiviye şirovekirina têkistê yên (fonolojî, morfolojî, sîntaksî, sîmantîkî, rîtmî...htd) li pêş çavan wergirin, di gel giringîden bi şirovekirina regezên zêdekirî di wê têkistê de. Di gel regezên pêkhênerên wî corê edebî, yê têkist pê hatiye nivîsîn, (heger hozan be, giringî bi wêne yê hozanê, derêtina wî û zimanê wê, kêşe û rîtmên wê di gel erkên wan di xizmetkirina ronvekirina watayî de.

3- Cemserê wergirî (سلطه القارئ):

Pêdiviye astê rewşenbîrî û pêgehandiyê xwendevanî û îdolojiya wî û kawdenên derûnî, civakî û aborî... htd yên xwendevanî pêş çavan wergirin û bawerî bi desthelata xwendevanî hebe, çimkî peyam û têkist bo wî dihêne arastekirin.(4)

Di warê ariste û rêbazên rexneya nû de, çendîn mîkanîzim li ser rexnegirî hene, pêdivîne şehrezayî tê de hebe û di karê xwe yê rexneyî de peyrew bike. Bi kurtî, em dişên di van xalan de diyar bikin.

1- Mîkanîzmên girêdeyî zimanvaniya têkistê:

Li dû vê têgehê, çendîn hêlên berfereh hene, rexnegir tê de kar bike. Wek: Diyarkirin û şirovekirina kodên zimanî, zanistê sîmantîkî, mîkanîzma fonolojî, mîkanîzma peywendiyan, mîkanîzma pêkhate ya aşopî û stûnî, mîkanîzma nexşekêşan û serjimêriyê... hd.

2- Mîkanîzmên girêdeyî ruxsarê têkistê:

Li vê dirê, pêdiviye li ser çend tewerekan rabiweste, ew jî: Mîkanîzma bunyad û pêkhate ya tê-

kistê, mîkanîzma deqgîriyê, şiyana ji yek vavartin û ji hev cudekirina kêşe û rîtma têkistê, morfolojiya têkistê, laden a têkistê ji yasayên rêzimanî û hozanê.

3- Mîkanîzmên girêdeyî naveroka têkistê:

Di vî warî de giringî bi mîkanîzma (epistmolojiya) ya têkistê anku- ronkirina asoyên rewşenbîrî bi rêka vekolîna hêma û amaje û felsefe û babetî aydolojiyê têkistê, zêdebarî bihayê edebiyê berhemî û erkên edebî û hizirkirin û tewîlê.

4- Mîkanîzma peywendiyên têkistê:

Di şiyan de ye di gel mîkanîzma ruxsarê têkistê bihête dîtin û di şiyanê de ye bi ser bi xwe lê binêrin, ew jî mîkanîzmadeqgîriyê û den pêden bi desthelata xwendevanî di gel araste û dîtin û hizirkirinên wî di têkistê de.

Li ser van binçîneyan, erkê rexne yê bo me diyar dibe ku ew têkista vekolîn li ser dihête kirin ka ji hemû layenên pêkhate ya xwe ve dişêt çi bêje û çawa gotiye, lê divê bizanin ku rexnegir di gotinên xwe de, ne azad e, belku gotin û karê wî xwedîkeke, çaweniya berhem û sîfatên wî diyar û aşkere dike li dû çendîn pêver û yasa û arasteyan.

Rolan Bart dibêje: "Her karekî edebî pêdiviye bihête biniyasîn, anku pêkhate û taybetmendiyên wê têbigehin, de bişên bi durirstî wî berhemî di axa xwe de hembêz bike".(6) Li ser vî binçîne yî erkê rexneyî bi vekirina karê edebî ve dihête girêden. Piraniya rexnegirn di wê baweriyê de ne ku di gel ruxsarî de cîhaneke din heye, pêdiviye bihête dîtin. Cîhana hizir, hest, aşop û barên derûnî.... htd, ji ber hindê pênase ya şêwazî dike ku ji ruxsar û naverokê pêk diwere.

Li dor vê çendê, Bofon dibêje: "Şêwaz mirov bi xwe ye, anku her mrovekê şêwazek xwe yê taybet heye.

Her dîsan Kirotşê almanî jî, ji rêk cudekirina şêwazê di gel ruxsarû naverokê û ji jêk cudekirina ruxsarê ji naverokê, bi ser û bi ve red dike . Çimkî piyavê şêwazê rihên xwe di nav her dukan de dibîne û ruxsar jî hilgira wan bîr û hizra ye yên di naverokê de heye û harîkare ji bo ronvekirina wan, ji ber vê çendê baştire her duka li bin nav û têgihê şêwazî kom bikin. Ser vî binçîney bo her têkistekê çendîn xwandin hene û her yek jî dê layekî wê têkistê bigire, bi giştî em dikarin bibêjin ev corên xwandinê di ber çav in. Xwandina êstatîkî û bihayê ciwaniyê berhemî, xwandina tewîlî ya şirovekir, xwandina vezivrînkî.

Hindek têgeh û corên rexneyî :

Rexne di qûnaxa kilasîkî de, rexneyeke pîverkî bû. Piştbest in bi hindek yasayên diyarkirî weku yasa hilbijartina corê edebî, pêdivîbûn bi yekitiya organî.. htd evan yasayan di demê desthilata kilasîkî de, li çerxçên 16/17/18/ ê meydena rexneyê degîr kiribû.

Ev corê rexneyê piştgermên hindek yasayên kevinbû. Lewra, her dem, hevirkê nûkirinê bû. Bi dîtina wê, nûkirin dûrkevtin e, ji wan ya-

sayên ew peyde dike. Piştî romensiyat di edebiyata Ewropî de, serhildey di gel de core rexneyake din serhilde, ya dûr bû ji rexneya pîverkî, ew jî, rexneya rêrewî (dîrokî, civakî, derûnî) bû.

Rexneya rêrewî di çerxê 19ê de, li Ewropa serhilde. Her weku Solîntiz dibêje: "Hizra rêrewî, bi hêztirîn hizirên çerxê 19ê bû û karîger tir bû." Li vir, mebesta wî bi rêrewî (her tiştek nahête wergirtin û şehrezabûn tê de peyde nabe, dûr ji zanîna wan fakterên bûne egerê duristbûna wê, di gel diyarkirina wê peywendiya, di navbera wan fakteran û têkistê û nivîserê têkistê de, hene. Li vir, arasteya girêdena berhemê edebî di gel dem û cih û jîngeha wê, dihate meydenê. Lewra rexnegirê rêrewî, zêdebarî aşkerekirin û ravekirina hindek peywendiyan di navbera rêrewên derveyî têkistê, ewên girêdeyî nivîserî û eger û palderên berhemhênerên wê têkistê, ew ber bi dena hindek biryar û ehkaman ve, diçû ku gelek bi giroveyên diyar û bi hêz, sade û palpişt nebûn.

Egera arasteya rexneya rêrewî, di rojavayê de weku karvedenekê dijî rexneya kilasîka pîverkî, serhilde. Lê di rexneya rêrewkî de hizra hebûna rêrewî hate di gorê de, bizav dikir vekolîn a berhemê edebî û nivîserî bi xwe jî, bihête kirin, bi rêka giringîdan bi bar û dox û jîngeh (dem û cih û derûn) û dewr û berên nivîserî, lê ji ber ku xwe gelek bi van fakteran ve girê di da, ev bû egera wê çendê ku edeb gelek caran weku tiştekê lawekî, bihête dîtin û ta radekî gelek, giringîdan bi edebiyata têkistê bi xwe, lawaz û sist û xav bû.

Lewra, arasteyeke din, di rexneyê de, serhilda, ew jî arasteya rexneya têkistî bû, ev corê rexneyê rêrewên derekî bi pişt guh êxistin û hemû giraniya xwe, êxiste ser têkistê bi xwe. Ji bo diyarkirina sîma û saxletên hunerî yên têkistê bi rêka şirovekirina regezên wê û vekolîna peywendiya wan regezan di têkistê de, li ser wî binyatî ku têkist cîhaneke serbixwe ya temame û bi rêka vekolîna wê bi xwe hemû tişt aşkera û diyar dibe.

Nimûne bo rexneya têkistê; Formalîstên Rûs, rexneya nû, rexneya buniyadgerî , rexneya helwşîngerî, şêwazgerî ...htd.

Rexnegirê têkistî, bizav dike pêkhateya têkistê û peywendiyên di navbera wê pêkhateyê de, şirove bike, bi rêya zimanê wê (rîtim û delalet û ....htd) bigehe encam dan. Evca çi bi rêya kiryarên serjimêrî be yan nexşekêşan û matmetîkî.....htd be. Evan rêka ji bo qazanca gehiştine edebiyata berhemî bi kar diînin.

Armanca vî corê rexneyê wesifkirina pêkhateya zimaniya têkistê ye ji bo vedîtina ciwankarîyên wê (eve jî bi rêka şirovekirina zimaniya yekeyên têkistê ye ji bo vedîtina delaletên têkistê û şêwazê û awayê nivîsînê yên nivîserî, bi rêka karkirin li ser têkistê bi xwe dûr ji giringîdan bi fakterên dewr û berên têkistê û nivîserî.

Eger stûna karê rexneya rêrewekî giringîdan be bi navaroka tê-

kistê bi rêka rêrewên wê yên (civakî, dîrokî, derûnî), ev wê nagehîne ku rexneya têkistî, naverokê feramoş dike (belku her yek, ji bo dîtina wê naverokê, rêkekê peyrew dike.) Çimkî têkist ji çend regezekan pêkdiwere (ziman û yekeyên pêve girêdeyî , rîtim û hizirên tê de hilgirtî), vekolîn di van regezan de, bêguman e ber bi vedîtina delalatan ve dibe.

Vekolînên (rexneya têkistê) pitir girêdeyî wesifkirineke babetiyane ya bê layene di pêkhateya zimanî de, anku rexnegir bizavê dike ji bo diyarkirina pêkhateya edebiyata têkistê helçûnên taybet bi kar ne îne.

Fesikirina babetiyane ya bê layen, yeke ji saxletên giring di rêbazên nû yên rexneya têkistî de, bizavê dike, ewî samanê veşartî yê di nav têkistê de, aşkere bike.

Bi boçûna min, baştirîn arasteya rexneyî, giringîdan e bi têkistê bi xwe, bi pêkhate û delalet û rîtma têkistê, lê divê em layenên dîtir jî, bi yekcarî pişt guh neêxin. Çimkî delalet û nîşankar û peyvên kilîlî di têkistê de, gelek caran pêdivî bi hindek layenên derekî ji bo ronkirina rêrewên wan heye.

Di piroseya encamdana rexneyê de, gelek caran em hindek zarav û têgehan bi kar diînin dûr ji mebesta me û her di mêşkê me de, ew ne encam in, lê divê eşkera bikin:

1- rexneya tiyorî (theoretical criticism):

Erkê wê ewe ku li dû çend yasayên giştî bi selmandina komeke pêk ve girêdayî ya zaravan rabe, dîsan ravekirina zarav û rêkên karkirin û çarekirina hêlên diyar di kiryaya rexneyê de.

2- Rexneya piraktîk (Pratical criticism):

Giringiyê bi gengeşekirina berhem û nivîserên destnîşankirî, dike, ew yasayên tiyorî yên zal li ser encam û peyrew bike, da ku bigehe hindek encamên ne diyar û berze.

3- Rexneya Întîbaî (Împressionist criticism):

Bizavê dike berhemekî destnîşankirî yan çend parçeyên wî berhemî wêne bike û derbirînê ji karvedanên (انطباعئ) yên rexnegirî bike ewên ji layê berhemî ve dihête durist kirin, her weku (Hazlêt) di gotareke xwe de, dibêje: "Tu biryarê li ser bincîneyê hestên xwe didî, ne li ser binçîneyê hizirkirinê, anku li ser binçîneyê wî (انطبـــاعئ) berhemê di mêşkê te de, bi cih hêlayî, serarî wê çendê ku tu nikarî wê (انطباعئ) bi ser û binên wê ve, rave û şirove bikî). Dîsna, Anatol Firansist dibêje: "Ev corê rexneyê dibe mixamerata giyanekê hestedar di navbera şakaran de."

4- Rexneya dadvanpêkirinê (Judicial criticism): Bi gehandina kartêkirnên berhemê edebî, tenê ranawiste belku bizavê dike bi şirovekirin û ravekirina wan kartêkirinan rabe li ber ronahiya babet û pêkhate û şêwaz û rêkên hunerî yên di berhemî de, bi kar hatî.